



Xizmetên wergera devkî ya bêpere

GUHERTINA XIZMETAN JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'ê

Bikaranîna xizmetên wergera devkî ya bi qualîte di rewşa belavbûna KOVÎD-19'ê da jibo kesên ku pisportiya wan a zimanê Ingîlîzî tune an pisportiyeye kêr hene, gellek girîng e.

Xelk divê li cihên li ber dest û heyî xizmetên wergerandina devkî bi kar bînin.

Derbarê **KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahiyan bi dest bîne**

Xizmetên wergera devkî ya bêpere çî ye?

Di babetên jêrê da, derfeta wergirtina xizmetên wergerandina devkî ya bêpere jibo te heye:

- Heke tu niştecihê Australyayê yî
- Karta te ya 'Medicare' heye; û
- Pisportiyeye te ya sînardar di warê zimanê Ingîlîzî da heye

Ez çawa dikarim xizmetên wergerandina devkî ya bêpere bi dest bixim?

Raberkirên xizmetên jêrê dikarin ji aliyê te va xizmetên wergera devkî ya bêpere bi dest bixin:

- Bijîşkên xusûsî
- Derman-çêker
- Rêxistinên sivil
- Navendên danûstandina milk û malan
- Rayedarên dewletî yên xwecihî, wek Konseyên xwecihî
- Yekîtiyên Karkeriyê; û
- Endamên Parlîmanê.

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir derbarê van xizmetan, seredana **vir** bike.

Raberkirên xizmetên jorê dikarin heta çend deqîqeyan bi wergêrekî devkî ra bikevin têkilliyê da ku ji wergirtina lêzanîn û şewirîne bi zimanê te piştrast bibin.

Wergêrên devkî

Wergêrên fermî yên Rêxistina Neteweyî ya Wergêrên Devkî û Nivîskî yên fermî (NAATI) tên bikaranîn. Wergêr sozdarê rêzicknameyêke tevgeriyana profesiyonal in ku van pêwîstiyên dide ser milê an:

- Wergerandina durust û rasteqîn a lêzanînan
- Parastina Nihênîbûnê
- Bê-alîfî û Dadmendane bûn; û
- Sozdariya bo tevgeriyana profesiyonal di hemî wextan da.

Sûdwergirtina ji pîrraniya wergêrên devkî yên heyî, siyaseta xizmetên wergera devkî ya belaş e. Ji ber vê yekê daxwaza jibo wergirtina wergêrên devkî yên taybet nayê pêşniyarkirin.

FIS çî xizmetan raber dike?

- Wergera devkî ya telefonî ya lezgîn. Ev xizmet jibo wergera devkî ya ji pêş va organîzenekirî, gunan e û dikare babetên jêrê raber bike:
 - Berdestbûna zêde ji 3000 wergêrên devkî di zêde ji 160 zimanan da
 - Xizmetên wergera devkî bi awayê şev û rojî û 7 rojên heftayê
 - Têkilliya tev wergêrê devkî di çend deqîqeyan piştî têkilliyê da.
- Wergera devkî ya telefonî ya ji pêş va rezervbûyî.
 - Jibo wergera devkî ya ji pêş va organîzekirî an jibo hewcetiya bi daxwaza jibo zimanên kêmnas sûdmend e.